POLIZEI
Nordrhein-Westfalen
Landeskriminalamt

**nêz ji welatî • şareza • serweriya qanûnê**

# Diyardeyên sûcê li qada giştî ji hêla kes an komên mirovan ve

## Agahiyên pêşîlêgirtinê ji bo welatiyan

Tevgera ewlekarî, wekî ku hûn ji trafîka jıı pê dizanin, li her tevgerê re li qada giştî derbas dibe. Tevgera pêşbîniyê dihêle hûn xetereyan nas bikin û di wextê de ji wan dûr bikevin. Nihêrtina we ya ji xetereyên muhtemel û dûrketina ji rewşên xeternak yên li qada giştî divê ne wekî sînordariyek azadiya we ya şexsî, lê wekî zêdekirina ewlehiya we were fêmkirin.

### Hîsa ewlehiyê û ewlehiya rastîn li qada giştî dikare bi şîretên tevgerê yên jêrîn were baştirkirin:

- Heger hûn rastî kesek an komek mirovên ku hûn wan tehdîd dibînin re werin (mînak serxweş, mirovên zordar), wê hingê dibe ku biryarek çêtir be ku meriv xwe ji vî kes an komê dûr bixe û rêyek dirêjtir bide ber xwe. Heger mûmkîn be û hûn xwe ewletir hîs bikin, ber bi qeraxa girseyê biçin da ku bigihîjin armanca xwe. Dûrketina ji xeterek hîs pêkirî qet nîşana tirsonekiyê nîne, lê belê „aqilê selîm“ nîşan dide.
- Gava ku hûn di rê de ne, ew dikare bibe alîkar ku hûn di komekê de li hev bicivin û li hev miqate bin û heger hewce be, piştgirî bidin hev. Heger hûn xwe di rewşek xeternak de bibînin, bala xwe bidin ser xwe û rewşa xwe. Bi qîrîna hevokên bilind yên wekî „Dest nede min“, „Êrîş li min tê kirin!“, an jî bi amûrên alarman û pîspîsokan bal bikşînin ser xwe û raya giştî biafrînin.
- Bi awayekî aktîf ji temaşevanan, mînak, wek kesên derbasbûyî, bixwazin ku alîkariyê bidin. Bi taybet bi van kesan re bi gotinên wek „Hûn bi çakêtê şîn! Pêdiviya min bi alîkariyê heye!“ biaxivin. Bi vî awayî, dibe ku kesên din rewşa we ya acîl nas bikin û bi hejmara acîl 110 re telefon bikin da ku ji polîs alîkariyê bixwazin.
- Hewil bidin ku li ser rêya xwe ya bijartî bidomînin an ber bi deverên ewle vekêşin. Deverên ewledar dikarin cîhên karsaziyê yên vekirî, veguhestina gelemperî, stasyonên benzînê an jî taksî bin. Hema ku hûn dîsa xwe ewle hîs bikin, bi jimareya acîl 110 polîs agahdar bikin.
- Her çend hûn bi xwe tu gefê li ser xwe nebînin jî, lê heger hûn tevgerên dersînorî an tehdîdkar yên kes an koman li hember mirovên din bibînin, dudil nebin ku bi jimareya acîl „110“ polîs agahdar bikin!
- Di her rewşê de li ba polîs giliyê sûcê qeyd bikin.

**Têkilî:**
**Landeskriminalamt Nordrhein-Westfalen**
**Völklinger Straße 49**
**40221 Düsseldorf**

**Rewş: Tebaxa 2022´an**

## Agahî li ser îhtîmala hilgirtina çekên berevaniyê:

Polîs bikaranîna çekên bi navê berevaniyê krîtîk dibîne, yên wek spreyên berevaniyê. Her nezelaliyek di tevgerê de, her bi derengketinek di karanîna çeka berevaniyê de dikare encamên kujer ji we re pêk bîne. Dibe ku sûcdar jî bikaribe „çeka berevaniyê“ ji destê we bigire û paşê li dijî we bikar bîne. Bikaranîna spreyên berevaniyê yên li dijî mirovan, heger ew birîndar bibin, dikare di lêpirsîneke sûcê de pêvajoya lêpirsînê li pey xwe bîne.

Bala xwe bidin ku hemî çekên ku di bin qanûna çekan de ne û di bin hin şert û mercan de destûra „hilgirtin“a wan di nav gel de heye, li gorî § 42 ya Zagona Çekan hilgirtina wan di bûyerên giştî de qedexe ye. Ev yek sûc e. Hûn dikarin bêtir agahdarî ji navenda polîsê xwe ya herêmî bistînin.
**https://polizei.nrw/wachenfinder**

**Têkilî:**
**Landeskriminalamt Nordrhein-Westfalen**
**Völklinger Straße 49**
**40221 Düsseldorf**

**Rewş: Tebaxa 2022´an**